## Cudahiya siyaseta Rojhilata Navîn û welatên Ewrupî

»»» R:10




## Leka reş dê her reş bimîne

»»» R:4

*Bidestîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (447) 06-05-2023Buha (1000) Tûmen*

## PEYMANA LAUSANNE(LOZAN) Ê;

»»» R:5


## Rojhilata Navîn û qonaxeke nû

»»» R:8

# Peşqelê agirê şoreşê doxumxume

Rejîma dictator a Wilayeta Feqîh dixwaze wisa bide kivşê ku kariye şoreşê mat bike û kontirola her tiştî di destî wî de ye, û kariye heçî dengekî dijberî xwe bifetisîne.

Bi berewajiyê îdiaya dîktatoriya îslamî dengê şoreşê li heçî demê bilindtire, mijara cehd kirin bo sernixuniya rejîmê ji heçî demê xurttire, yekdengiya seranserî di nava xelkê seranserê Îranê û bitaybetî neteweyên bê maf de gelek ji berê qahîmtir e.



Dengê bi gur yê Kurdistanê, Belûçistan, El Ehwaz, Azerbaycan, Turkimen sehra, Loristan, Mazenderan û Gîlanê, rojane text û bextê dîktatoriyê dixîne lerzê û ev xewn û xeyala deshilatdarên rejîmê ku goya şoreş dawî pêhatiye, bi banga azadiyê û berxwedana xwe pûç kirine, xwîna ev hemî şehîdên şoreşa dijî dîktatoriyê îro di ceste û li hizra xelkê azadîxwaz de dikelije, bêguma rojeke negelek dûr dê biteqe û biherike careke din ji nû ve peşqelê agirê şoreşê dê bilind be û vê carê bi yekcarî text û bextê dîktatoriya hakim biherfîne.

Kîjan roj heye ku dengê xortên şoreşvan ên Rojhilatê Kurdistanê û peyman nû kirina wan di gel xwîna şehîdan gurîzankan neberdecestê dîktatoriyê? Kîjan roj heye ku gelê bindest û şoreşvan ê Belûç hêza berxwedaniya xwe nîşanî rejîma dîktator nede? Kîjan roj heye ku dengê nerizayetiya qat û texên cuda yên civakê li seranserê Îranê guhê dîktatoriyê ker neke?

Ku wisaye şoreş bi hemî awayên xwe berdewam e û tenê cirîqeyek vê carê dikare bibe sedemê serhildana burkaneke mezin bo şevitandina textê dîktatoriyê.

Ne çolbûna şeqaman, ne piropagenda medyay ya rejîmê, ne gef û gurên rejîmê, ne alozî çêkirina di gel welatên cîranan, ne girtin û ne îdama xortên welat, tu yek nikare çareya derdê rejîma dîktator bike, bi berewajî, heçî yek ji wan kiryarên rejîmê zêdetir dikare guloka rîsê rejîmê wereşîne û hinde din zêdetir û bileztir ber bi sernixûniyê ve palde.

Rejîm bi wan hemî pirsgirêkên ku hene û pareke berçav her bixwe bo xwe diafirîne, rewş gihandiye astekê ku ser teqînê ye, dunya hemî jê bêzar bûye, nêzî hemî xelkê Îranê wê rejîmê naxwazin û cehda sernixûniya wê didin, welatên cîran rejîma Îranê bi sebebkarê sereke yê tevdanî û aloziyên nava welatên xwe dizanin, lewra dîktatoriya Axûndî mehkum bi ji nav çunê ye.

Renge heya qaseke zaf dilê Xamineyî yê dîktator û rejîma wî bi wê hindê xweş be ku şoreş bê rêbere û bê lîdere û hêzên dijberî rejîmê nikarin hevbendiyekê ji bona altirnatîvê çê bikin heta ku xelkê şoreşvan ên navxweyî welat pişta xwe pê girêdin û pê dilgerim bin ku berdewam bin li ser domandina şoreşê, lê bi berewajî xelkê welat xwediyê hişmendiyekî bilind a berhevdana siyasîn e û her bixwe lîder û altirnatîva herî bihêz in, cuda ji vê yekê jî hevbendiya netewên bindest û bê maf ên Îranê wekî Kurd, Belûç, Ereb, Azerî, Turkimen û yên din in, mezintirîn û bihêztirîn hevbendiya dijî dîktatoriyê ye û bi berewajiyê cehda hin kesên din ku cehd dikirin bedîlê dîktatorê niha dîsan dîktatoriyekî din çêbikin û menşûr çêkirin û dîtin xelk li navxweyê welat de bi dijî heçî dîktatoriyekê dirûşman didin, lewma kes devrê nema û bû bilqa ser avê, lê hevbendiya netewan dikare nêzî hemî xelkê welat devra xwe kom bike û ya ku rejîm jê tirsiyaye jî her ev yeka ye.

Divê em baş bizanin ku rejîma dîktator çima ewqas ji netewên Îranê ditirse, çima Kurdistan û Belûçistan milîtarîze kiriye, çima gefa êrîşa bo ser part û aliyên siyasî û pêşeng ên tevgera rizgarîxwazî ya Kurd dike, rejîm baş dizane ku kê li meydanê de ye, dizane kê xwedî bandor e, dizane kê qisa yekem dike, hebûna xebat û berdewamiya wan netewan bo xwe û man û deshilata xwe bi gef dizane, bê guman her ew netewan in û xebata wan û rijd bûna wan bi dijî dîktatoriyê ye ku dê bikare peşqelê agirê şoreşê geş rabigre heya vê rojê ku dîktatoriya Îslamî bi yêkcarî biherife û ji nav biçe.

**Ev roj negelek dûre.**

# Mistefa Hicrî: Ji bilî sûcdarkirina vê û wê ji bo parçebûna xwe, em werin ser hişê xwe û hizr li girêbestek netewî bikin.



Ji bilî sûcdarkirina vê û wê ji bo parçebûna xwe, em werin ser hişê xwe û hizr li girêbestek netewî bikin.

(Deqa axavtina Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di konferansa 100 saliya Peymana Lozanê de)

Xwişk û birayên hêja!

Dixwazim silav û pîrozbahiyên xwe yên germ pêşkêşî hemû wan kesan bikim ku ji bo lidar xistina vê konferansa ku di helkefteke dîrokî de tê lidarxistin û hêjayî axavtin û xebatê ye, ked dane. Bi taybetî ne ji ber ku divê em her civîneke li dar bixin û jê derkevin, lê ji ber ku divê em jê ders bistînin. Ez ê zêde venegerim ser dîrokê û li paşerojê namînim, ku mixabin tijî peymanname û lihevkirinên li dijî mafên welat û neteweya Kurd li hemû parçeyan e. Ji ber ku ew qas dema me tune ye, lê ez ê bi kurtasî bi peymana Sevrê dest pê bikim.

Em di nav kurdewariya xwe de gelek caran dibêjin ku Peymana Sevrê mafên Kurdan îspat kir, lê Lozanê ew ji holê rakir. Lê, rastî ne wisa ye. Ji ber ku parçekirina Kurdistanê bi peymana Sevrê bû û hemû pirsgirêk û wêrankirina kurdan ji wê rojê dest pê dike.

Peymana Sevrê, bi dîtina min, ji roja çêbûna xwe ve mirî bû. Sebeba vê jî wedigere bo vê ku, para yekem, çarenivîsa piraniya kurdan bi awayekî pir xerab li ser her du welatên erebî yên Iraq û Sûriyê hat danîn. Para piçûk a ku li Kurdistana Tirkiyê mabû, di peymana Sevrê de otonomiya navxweyî hat dayîn. Lê, ew otonomiya hundirîn bi qasî sist bû ku her bixwe gav bi gav rê li ber hilweşîna xwe vekir.

Heger hûn bala xwe bidinê, di Peymana Sevrê de, ew para Kurdistana Tirkiyê behsa mafê xwe yê xweseriya navxweyî dike û ji welatên ku di şer de bi ser ketine, sê nûner destnîşan dike. Fransa yek, Brîtanya yek û Îtalya yek. Û ew hatine erkdarkirin ku di nav şeş mehan de proje-yasayekê ji bo mafên ku ji bo para biçûk a Kurdistanê ku mane amade bikin; Di heyetê de yek kurd jî nîne. Ji ber vê yekê, wekî piraniya peymanan, çarenivîsa neteweya kurd jî dê piştî şer dîsa bikeve destên kesên ne kurd ên ku dixwazin li gorî berjewendiyên xwe yên dagirkeriyê diyar bikin.
Piştî van şeş mehan, aliyê kêm em tiştek, an gelaleyek nabînin ku bibînin ka wan çi kir. Lê, her tişt girêday bi eger û ema yê. Di heman xalan de ku Peymana Sevrê ji bo Kurdan ji bo vî mafî, dibêje ku eger her sê kes di hin xalan de pirsgirêk hebin û li hev nekin, dewletên têkildar wê pirsgirêkê çareser bikin. Yanî dîsa bi meseleya dewletên ku kurd di nav wan de parçe bûne ve girê dide.

Ger ew yeka jî cî bi cî bibe, bala xwe bidin ku ew hemî eger û ema ! Eger wisa bû, piştî salekê kurdan ji koalîsyona dewletan xwest ku referandumê pêk bîne. Eger ew razî bin û Komela dewletan jî bipejrînin ku Kurd jî bibin xwedî mafê serxwebûnê, wê demê ewê wî mafî diyar bikin.

Ev hemû ema û egerên han ku tu garantiya bicihbûnê tunîne. Ji ber vê yekê em dikarin bi hêsanî bibînin ku di nava sê salan de ji Peymana Sevrê heta Lozanê dema ku li herêmê guherînek çêbibe û dewlet biryar bidin ku Tirkiye ku nû hatiye avakirin divê bibe xwedî îstiqrar, ewlehî û sibatê. Peymana Lozanê ji aliyê hikûmeta Îtalyayê ve hat îmzekirin û ragihand ku ew amade nin ji bo bicihanîna peymanê ti leşkeran bişînin bo bicihanîna wê lihevkirinê û Firansa û Birîtaniya jî gelek bi hêsanî paşekêşî dikin ku Lozan dispêrin bi dîrokê.

Ev qedera kurdan bû ku diviyabû mafên xwe bidest bidana. Ji ber vê yekê ez dubare dikim ku divê em di qurbanîbûna kurdan a piştî şerê cîhanê yê yekem de xeletiyê nekin.

Ne tenê Lozan bû, belkî li Sevrê dest pê kir. Ez ji we re mînakek behs bikim, welatên mayî çi bûn? Mînak dema Ermenistanê ku welatekî biçûk bû bi peymana Sevrê dixwest bibe welatekî serbixwe, welatên serketî ji serkomarê wê demê yê Amerîkayê xwestin ku piştgiriya Ermenistanê bike, dewleta Tirkiyê neçar bikin ku serxwebûna xwe bide selmandin û heta soza avakirina dadgehê jî bidin ku lêkolînê ji wan kesan bikin ku ermenî komkuj kirine.

Welatên ku şer qezenc kirine ji bo Ermenistanê vê yekê dikin, lê ji bo Kurdan ku me behs kir wisa bû. Ji ber vê yekê em dibînin ku peymanên navneteweyî ne di berjewendiya me de ne, an jî di berjewendiya me de nehatine temam kirin.

Bi dîtina min guncav e ku em her dem li ser pirskirina welatên cîhanê yên biryargir li ser hemî peymanên di dirêjahiya dîrokê de berpirsyar bikin.

Di vê mijarê de mafê çarenivîsa neteweyan di Peymana Sevrê de, an jî di konferansên Neteweyên Yekbûyî de bi fermî hatiye pejrandin. Werin em behsa windakirina mafên xwe bikin û we mafên me winda kiriye, em nemirin û ji cîhanê re bibêjin ku em ê zilma ku we li ser neteweya kurd kiriye ne efû bikin û ne jî ji bîr bikin.

Lê, hevalên hêja, ji bilî daxwazên me ji cîhanê re, ji welatên xwedî biryar, em li dîroka xwe jî binêrin. Me çiqas alîkariya xwe kir û me rê da dewletên xwedî biryar çarenivîsa me bigrin bi dest û ji destên me derxin?

Bi dîtina min tişta ku kurdan bi xwe kiriye ji ya ku dewletên biryardar di derbarê pirsgirêka kurd de kirine ne kêmtir e. Me di dema borî de û niha jî bi zelalî dît ku dema dewletên herêmê, dewletên cîhanê yên biryarder çav li xaka me dikin, wê demê em lawaz bûne û me bixwe ev derfet afirandiye.

Bi gotinek din bibêjim ku eger ji ber peymanên navneteweyî welatê kurdan çend caran hatibe parçekirin, kurdan bi xwe jî çend caran kurd perçe kirine. Niha jî dema ku em rûniştine û peymana Lozanê bi bîr tînin, nerîna min ew e ku em tu dersî ji wê dîrokê hîn nebûne.

Hîn jî di nav me Kurdên wêrankirî de ti peymanek netewî û hêla sor nemaye. Ya ku hate pirsîn ew bû ku ji bo kêmkirina bandorên veqetandinê çi were kirin? Em dikarin çi bikin ku êşa peymanên Lozan, Sevr, Cezayîr û yên din sivik bikin? Weke miletekî hişmend divê ev dîroka ber çavên me be ku me bi destê xwe çi aniye serê

Dom R:3

Doma R:2

xwe?

desthilata me ya welatên biryarder nîne. Berjewendî û qezencên wan hene û cîhanê û hêzan li gorî berjewendiyên xwe parçe dikin. Ji ber vê yekê, her çend em mafên xwe ji wan dixwazin û ji wan re dibêjin ku wan neheqî li me kiriye jî, divê em qebûl bikin ku ya diyarkere em bixwe ne.

Em ji xwe re bibin hêz û hêz ji yekîtiyê tê, lê dîsa jî em parçe dibin. Parçebûn tenê ev yeka nine ku sînorekî navnetewî diyar bikî û xak û welatê xwe parve bikî.

Belkî şikil û şêwazên cuda hene ku em li hemû parçên din yên Kurdistanê de pê re rû bi rû dimînin. Ger em bihêz û yekgirtî bin, dewletên herêmê cesaret nakin destverdana di karûbarên me de bikin. Welatên desthilatdar li pey me tên, ne ji bo mafên Kurdan, ji bo berjewendiyên xwe bi me şêwirmendiyê dikin û alîkariya me dikin. Ez ê mînakek nû bidim we.

Em behsa têkoşîna Kurd li rojhilat û Partiya Demokrat di derbasiya dûr de nakin. Ezê behsa tekoşîna Partiya Demokrat û partiyên din ên opozisyona Kurd li Îranê di bin desthilata Komara Îslamî de bikim. Di 45 salên Komara Îslamî de rêberên me şehîd ketin, axa me hat bombekirin, gelê me şehîd bûn, bi hezaran pêşmergeyên me di vê rê de şehîd bûn. Lê, di vê heyamê de hemû li ser hev bikin, bi danaberhev a xebata Kurd bi qasî wan şeş û heft mehan nebûye ku xebata “Jin, Jiyan, Azadî” li Kurdistanê hat destpêkirin. Çima?

Hevalan
Partiya Demokrat, Komele û partiyên din ên opozisyona kurdên Îranê ew in ku em di demên borî de me têdikoşîn kiriye. Lê, di dema borî de em ketine nav xwîna hev, me Kurdên rojhilat bêhêvî kirin, lê vê carê em di vê têkoşînê de bûne yek. Du demokrat lihev kirin, du komele lihev kirin. Komele û Demokrat navendeke hevkariyê ava kirine.

Me ji gel re got bila bikevin grevê, gel jî dest bi grevê kir. Me ji wan re got dakevin kolanan, ew daketin qadan û têkoşînê ne tenê li Kurdistanê, li tevahiya Îranê belav bû. Li Îranê ranewestiya û sînor derbas kir û li seranserê cîhanê belav bû. Îro piştî derbasbûna 7 mehan, rojek li Ewropa û Amerîkayê nîne ku Îranî bi hev re li dijî Komara Îslamî dernekevin kolanan û daxwaza rûxandina wê nekin ku Spaha Pasdaran bixin lîsteya terorê.

Ewqasî ku van welatan givaş xistine li ser Komara Îslamî ya Îranê, sepandina dorpêçan li ser rejîmê û piştevaniya serhildanên gelê Kurd û neteweyên din ên Îranê di çil salên borî de bêmînak bûye. Ji ber vê yekê, ez careke din daxwaz dikim ku li şûna ku em xwe bêsûç bikin û hemû xeletiyan li ser vê û wî bixin, em werin ser hişê xwe û li xwe binêrin. Werin em xwe reform bikin.

Ger em mafdar in û têkoşîn û qurbanîdana me ji bo azadkirina ax û gelê me ye, bila carekê li berjewendî û qezenca welatê xwe bifikirin. Werin em ji berjewendiyên xwe yên teng ên hizbayetî û eşîrî xilas bibin. Wekî din ne mimkûn e ku li tu derê cîhanê rehmê li me bikin û hawara me bên.

Gelek sipasiya we dikim

# Navenda Hevkarî: Em ji civatgeha cîhanê daxwazê dikin ku li hember gefên Komara Îslamî bêdeng nemînin

Xelkê xebatkar û azadîxwazên Îran û Kurdistanê!

Rêkxistinên mafê mirovî û civatgeha navnatewî!

Rejîma Komara Îslamî ku li hember xwenîşandan û serhildana xelkê û şoreşgêrî ya Jînayê kevte qedeman, bi bikaranîna maşîna îdamê û dezgeha serkutê ji aliyekî ve û ji aliyê dinê ve bi anîna hêz û gefxwarinên êrîşa mûşekî û dironî, di hizira qirkirina jin, zarok û penaberên Kurdên Îranî de ye ku bi salan e li Herêma Kurdistana Îraqê dijîn.

Em hemû dizanin ku serhildana şoreşa Jin, Jiyan, Azadiyê li Kurdistanê bû. Me wek hizbên siyasî yên Kurdistana Îranê gelek caran ragehandiye ku me pişta xwe daye tevgera medenî û nerazîbûna xelkê û me ji nav axa Kurdistana Îraqê ti operasyonên leşkerî nekirine û nakin. Lê rejîma Komara Îslamî çendîn car bi mûşek û dironan êrîşê ser me û kampên me kiriye û can û malê xelkê Kurdistana Îraqê jî, ji êrîşên wan di asayişê de nebûne.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê daxwazê ji hemû sazî û rêkxistinên navdewletî û mafê mirovî û hemû hêzên navçeyî û cîhanî dike da ku li hember cinayetên Komara Îslamî ya Îranê li dijî hizb û penaberên Kurd ên Îranê helwestê nîşan bidin û bi kiryar hewlê bibin da ku pêşiya wê yekê bigirin.

Em ji hemû xelkê Îran û Kurdistanê li hundir û derveyê welat daxwazê dikin ku bi xwenîşandaneke cemawerî bersiva her cure destdirêjiyên Spaha Pasdaran bidin.

Mirin û neman ji bo rejîma dîktator a Komara Îslamî

Bijî yekîtiya xebatkarane ya gelên Îranê li dijî rejîmê

Jin, Jiyan, Azadî

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê

ناوەندی هاوکاریی حیزبەکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan’s Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

11ê Cozerdana 1402 a Rojî

1ê Hezîrana 2023an

# Leka reş dê her reş bimîne



N: Nûredîn Sofîzade



Berdana terorîstekê, nikare ruçkê terorîsmê li ser rejîmê paqij bike.

Teror û ji navbirina fizîkî ya neyaran hertim wekî çekekî qirêj û dûr ji hemî pirensîpên mirovahiyê û navnetewî, di destê wan hikûmet û deshilat û band û girûpên dîktator û xwesepên bûye û bi dijî neyar û dijberên xwe bi kar anîne.

Teror bi dirêjahiya dîrokê hebûye û hekî em bixwazin bizanibin ku teror kenkê bi awayê sîstematîk hatiye bikaranîn, hewceye ku em amajeyekê bi danerê bingeha terorê bo cara yekem di dîrokê de bikin.

Hesen Sebah dema ku deshilatdarê Kela Elemût bû û ji bona parastina deshilata xwe cehd dikir ku heçî dengekî bi dijî xwe û deshilata xwe tepeser bike û ji nav bibe, di cihê vê ku li asta xwarê û mam navendiya civatgehê de bi giştî tepeser bike ku kevtibûne jêr bandora neyarên Hesen Sebah, kevte şopa vê yekê ku lîderên nerizayetî û dijberên xwe nas bike, di destpêkê de ev hemî nas dikirin û ji bona evê ku bi aşkera wan negire û nekuje, hinek kesên çeleng û heta çi peywendî bi deshilata wî jî nebûn, komî ser hev kirin û perwerda kuştina neyaran da wan kesan ku pişî kuştina heçî yek ji neyarên wî, çi şop û devsekê jî bi dû xwe re nehêlin, bo encamdana heçî teroreke jî, wan bikujan anku terorîstên Sebah, diba Heşîş bikêşandibana û serxweş bibana, daku di encamdana teroran de hem poşman nebin û hem bê rehim bin. Gelek nekêşa ku ev girûpa terorîstên Hesen Sebah ku bi girûpa Heşîşiyan hatibû naskirin, karîn piraniya neyarên deshilata Elemûtê ji nav bibin û tirs û xofeke mezin jî bixne nava xelkê ku êdî tu kes jî dijayetiya Hesen Sebah û deshilata wî neke. Hesen Seba di rûpelên dîrokê de wekî danerê bingeha terorê bo yekem car tê naskirin, Sebah kesekî îdolojîk û Oliyekî tundrew Şîeyê 13 Îmamî bû ku xwe peyrewê firqeya Îsmaîliye dizanî.

Ji vê demê ve heya niha deshilatdarên Îranê û bitaybet peyrewên Şîeyan û firqeya Îsmaîliye di Îranê de ji bona parastina deshilata xwe û bona ji navbirina neyarên xwe, hawara xwe bo terorê dibin.

Ger em binêrin piştî derbasbûna nêzî Hezar salî bi ser nemana yekemîn damezrênerê Terorê, îro rojê rejîma Îslamiya Wilayeta Feqîh jî ku xwe peyrewa firqeya îsmaîliye dizane û Elî Xamineyî yê dîktator jî ku xwe murîd û teqlîdê Hesen Sebah dizane, çeka herî kara ku bi dijî lîder û kesên dijberî xwe û deshilata xwe dizane, bikar tîne, Teror e. Cinayet û teror û mirovkujiya rejîma Îranê di astekê de ye ku avekî paqij bi ser destê Hesen Sebah û hemû terorîstên cîhanê dakiriye, Rejîma Komara Îslamî her di yekem rojên gihîştina xwe bi deshilatê, destbicî girûp û kesên terorîst perwerde kirin, hev şêweya Hesen Sebah hem mejiyê terorîstan bi îdolojiya xwe tijî dikir, hem bona kuştina neyaran ev serxweş dikirin.

Rejîma terorîst û terorîstperwer a Axundî, ne tenê di nava Îranê de, belkî di asta zaf welatên cîhanê de girûpên terorîst ên girêdayî bi xwe çêkirin, Deshilatdarên rejîmê hemî dar û nedar û serweta welat xistine xizmeta bi dehan girûpên terorîstî li welatan de. Rejîma Îranê heçî dema ku derfet peyda kiribe û jêre çobe serî, li heçî cihekî dunyayê be, bona teror û kuştina neyarên xwe û bi taybetî hêzên siyasî yên dijberî xwe û rêberên siyasî û xwedî bandor, terorîstên xwe hinartine û kiryarên terorîstî encam dane, lewra rejîmek ku di cehda terora neyarên xwe de, li heçî cihekî cîhanê de be, ev kiryar û ji navbirina fizîkiya neyaran, dibe terorîsma navdewletî.

Kêm ninin ev mînakên ku kevtine ber terorîsma navdewletiya rejîma Îslamî, li ku dera wê cîhanê de teqînek bibe, terorek bibe, xirabkarî, barimtegirtin, pîlan û tevdanî û şer û alozî çêbibe hekî binîça vê têt vekolîn, bi curekê destê rejîma Îranê tê de hebûye.

Teqîna navenda cihûyan li Arjantînê, teqîna navenda serbaziya nevnetewî li Lubnanê, teqîna navenda hêzên serbaziya Amerîka li Erebistanê, bi hezaran teqîn li Îraq û Sûriye û Efxanistanê bi dijî hêzên navdewletî, Terora Herîrî li Lubnanê, danana navenda 15ê Xordadê û diyarî kirina xelat bo terora Selman Roştî û li dawiyê de jî cehda sernekevtiya terora wî, ku bi birîndarî û seqetî jê xelas bû, gefa terora deshilatdarên Amerîka ji wan Pompeo û Bolton, Ji neyarên xwe û lîder û kesayetiyên siyasî yên Îranî em dikarin amajê bi wan çend rêberên naskirî bikin, Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî, û sedan kadr û pêşmerge û endamên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, Kazim Recewî, Şapûr Bextiyar , Ebdulrehman Birûmend, Fireydûn Feroxzad, û dehan kesayetiyên din.

Rejîma Îranê heya niha çendîn caran û li dadigehên navnetewî de û yên welatan wekî rejîmeke terorîst hatiye nasandin û rêberên pile yekem ên rejîmê wekî biryarderên wan kiryarên terorîstî hatine nasandin û heta biryara celb û girtina wan hatiye danê ku mînaka herî berçav hikmê dadigeha Mîkonosê bû.

Rejîma Îranê Di navxweya welat de jî, berdewam bûye li ser terora heçî dengekî dijberî xwe û terorên zincîreyî yên dehka 1990an, ku bi qetlhayê Zencîreyî hatiye naskirin, rêber û kesayetiyên zanistî û nivîskar û rewşenbîr û rojnamevan û siyasî û olî, yên wekî Mela Mihemed Rebî`î, Daryûş û Perwane Firûher, Mihemed Muxtarî, Mihemed Ceifer Pûyende, Mecîd Şerîf, Hemîd Hacîzade, Xefar Husênî, Pîroz Dewanî û gelek kesên din, teror kirin.

Tu kes nine ku haya wan ji ev hemî cinayet û terorîsma rejîma Îranê nebe, lê ya ku wekî belge li asta navnetwî de dikare rûyê rastîn yê terorîsma navdewletî ya Îranê be, girtin û dadigehîkirina çendîn terorîstên hinartiya rejîma Îranê ne ku di dema encamdan yan pîlan danana teroran de li zaf welatan hatine girtin û di dadigehên serbixwe de hatine mehkumkirin, ku em dikarin amajê bi Kazim Darabî, Enîs Neqaş, Elî Wekîliyê Rad, Mihemed Ceifer Sehrarûdî, Esedula Esedî, û dehanên din. Rêberên herî pile bilind yê rejîmê ji wan Elî Xamineyî, Refsencanî, Wilayetî, Muhsin Rizayî, Elî Felahiyan, û hemî fermandên Sipaha Pasdaran li çendîn dadigehên navnetewî de wekî terorîst û biryarderên terorîsma navnetewî hatine naskirin.

Îro ya ku welatekî wekî Biljîkayê bi hinek sat û sewdaya di navbera xwe û rejîma Îranê de, terorîstekî wekî Esedula Esedî radestî Îranê dike, nikare nav û leka mirovkujî û terorîst bûna rejîma Îranê kêm biket, Ma Kazim Darabî yê terorîst hat serbest berdan, ma biryara dadigeha Mîkonosê hilweşiya? Ma Elî wekîliyê Rad hate serbest kirin, perwenda terora Bextiyar a rejîma Îranê derkevt?

Bi berdana terorîstên ku tenê cîbicîkerên biryara rêberên rejîmê ne, tu tiştek ji meselê naguhere û rejîma Îranê li tevahiya xwe de rejîmekî terorîst û terorîsperwer bûye û bê guma dema vê hindê nêzîk bûye ku rêber û deshilatdarên maka terorê anku rejîmê bikevne ber dadigeh û biryara xelkê azadîxwaz ên Îranê û bi taybetî malbatên qurbaniyên terorîsma rejîma Îranê.

# PEYMANA LAUSANNE(LOZAN)Ê;

## N: Kofîxwar

Bi dirûşma "Dînê me yek e,em birayê hev in".Xapandin û Tunehesibandina Kurdan Ango Mirin .

Ji pey Peyama Qesra Şîrîn(sala 1639-li nav Faris û Osmanîyan tê destnîşan kirin) )Kurdistanê bi Lozanê ve (Cî û warê Kurdan,axa wan e wek şîrê helal) dê dîsa bê perçe kirin.Piştî têkçûyîna Împaratoriya Osmanî dewletên Ewrupî di nav xwe de axa serwerîya Osmanî bi peymanên geh aşkare geh ne aşkare tê perçe kirin,PÎştre wê bê zeft kirin. Pirrtir desthilatdariya Kurdistanê bala wan ê bikişîne.

Bi peymana Qesra Şîrînê ve perçeya Kurdistanê ya mezin di bin desthilatdariya Osmanî de dimîne.Lewma ew peymanan ji bo dahatûya kurdan zahf gîring e.Çimkî bi wan peymanan ve Kurdistanê dîsa perçe perçe bibe û Kurdên jî jenosîdeka pir alî û herdemî ve rû bî rû bimînin.Bî xeynî cîhê wê yî jeopolîtîk hebûna neftê(petroil) bextê kurdan reş dike.Bi taybetî Îngîlîzan dixwestin ji ber hebûna neftê hemû Kurdistanê bi dest bixin.Çimkî kompanyayên mezin ên derxistin û raguhestina neftê bi destê Îngîlîzan de bû.Lewma rêya dewleta Kurdistanê tim û tim girtin.Pirrtir bi destên wan welatê kurdan bi perçe perçe bû.Ji bo ku dijberî li nav wan derneke ve Fransîyan jî dike şirigê xwe. ji bo cîbûna vê armancê herdîsa di nav hev de peymaneka ne aşkare destnîşan bikin.

Sykes –Picot;di sala 1916an de li nav nûnerên Îngîlîzî Sir Mark Sykes û yên Fransî François Georges Picot hatiye destnîşan kirin.


Rengê Şîn û cihê tîpa A'yê ya Fransayê,rengê sor û cihê tîpa B'yê ya Îngîlîstanê bû.

Li gorî nexşeyê Kurdistan di nav xwe de perçe kirine desthilatdariya xwe bi reng û tîpan ve dîyar kirine.Tê dîtin ku Başûr di destê Îngîlîzan Bakûr jî pirranî di destê Fransîyan de dimîne.Lê piştre yên sînorên vê peyamê berfireh bikin Rûs û Îtalîyên jî tevlî bibin,cihên bermayîyên Osmanî di nav xwe de dabeş bikin.Bi vê peymana ve bêne Sevrêsê.

Di Sevrê(1920) de şirigên wan ên li ser parvekirina Kurdistanê dê zêde bibin.Îca wê Ermenî û Tirkan bikin şirigên Kurdistanê.

Dê Ermenîstanê di bin bandora Rûsan de,Tirkiyeyê jî bi piştgiriya û bandora Îngîlîzan bêne ava kirin. Bi naqokiyên li nav Dewletên tevlî peymana Sevrê bûne Sevr bi cî nabe. Herçiqas rewşenbîr,serîkêşên kurdan hewl bidin ku Kurdistanê ava bikin jî hezên tevî Sevrê bûnê ji ber hebûna zenginiyên Kurdistanê ku di wê demê ya sereke neft e rê nadin ew armanc,doza Kurdistanê bi cî bê.Bi ser de rêya jenosîda kurdan wê bê vekirin.Mustafa Kemalê yalîkî rewşenbîr û Serîkêşên kurdan bêhîkarî bike yalîkî jî tim Peymana Sevrê wek metirsiyekê bîne li pêş kurdan. Çimkî di Sevrê de perçeyeka kurdistanê diyarî Ermeniyan kirine.Ji bo li hev kirinê hemdînêyê,umetê derxîne li pêş kurdan.Heta Lozanê dê wisa bikin.

Lozan Bi dirûşma "Dînê me yek e,em birayê hev in"ve Xapandin û Tunehesibandina Kurdan e.Lê mesele ne tenê ev e.Mesele dilnekirina dewletan e ku kurd li ser axa xwe xwedî dewlet bin,pêşiyê




Îngîlîstan rê nade.Mînak;erîşa li ser Mehmûd Berzencî. Axa Kurdistanê kirine 'Mesopotamia,Rojhilata Navîn ...' Xeynî Kurdistanê bi çend nav lê kirine.Li ser axa Kurdan Surîye,Iraq,Edirbecan,Ermenîstan(Rewan cî warê kurdan ê qedime) Tirkiye ava kirine.

100 sala Lozanê ji bo kurdan çi ye?Divê çi bête kirin? Ji bo vê hîn alî dibêjin qet nebe Dewletên li ser axa kurdan ava bûye şertên Lozanê bi cî bînin.Hin mafên însanî û kulturî bi dest bixin. Divê ji ber wê kurd hewl bidin hebûna xwe dîsa qet nebe di nav dewleta heyî de bidin qebûl kirin.Hîn alî jî dibêjin dema Lozanê qediya êdî Lozan pûç bûye.Lewma ka em sedemên vê hişmendiyê bi çend hêmanên Lozanê ve aşkere bikin.

Madde 37: Divê Tirkiye heta maddeya 44an girîngî û naveroka wan bixe bingehîna hemû zagonên xwe.Divê tu zagon û rêzname li dijî wan nebe.

Treaty of Sèvres




Madde 38: Hikimeta Tirk li nav sînorê heyî de ti dijbêriya li hemberî netewe û kêmneteweyan neke,hemwelatî divê bikaribin bi azad bi dil û can mafên xwe yên Însanî bi kar bînin.

Madde 39 :Divê hemwelatî danustandinê bigre heta dadgehê ji dadgehê bigre heta çapemeniyê bikaribe bi zimanê xwe yê zikmakîyê bi hêsanî bi kar bîne.Ji bo vê divê dewlet hemû rêyan veke,derfetan bide.

Bi kurtî be jî ew hêman nîşan dikin ku tu carî dewletê rêya wan mafan venekiriye ango peyman bin pê kiriye.Wêkî hebûna kurdan.

Ji ber vê divê Kurd sedsala peymanê bike sedemekê ku ji berê bêhtir dîplomasiyê bi kar bîne.Diyaspora xwe ji bo vê xurt bike,armanca hebûn teva bi dest xistina hemû mafan çalak be. Ku roja îroyîn mafên bingehîn nikare bi azad bi kar bîne.Herweha li ser medya civakî bêhtir ciwan û zarokan ferî ziman,dîrok,çanda xwe bikin.

Çimkî Ji ber modernîteyê,tunehesibandina kurdan pê pê de ziman û çanda xwe,eslê xwe wenda dikin. Haya gelekan ji dîrokê nîn e.Ji ber wê heyraniya serweriyên xwe dikin.Beriya her tiştî baweriyê bi xwe bikin lewma zanîn ji her tiştî giringtirîn e.

Bi hêviya serkeftinê.

# Dr.Mihemed Zeyno: “Belê sed sal derbas bûn, sed salên xwînî û tundî û hewildana qirkirina gelê kurd û tunekirina hebûna kurdan.”



Dr. Mihemed Zeyno

**Me di gel Dr. Mihemed Zeyno li bara Peymannama Lozanê hevpeyvîn pêk anî navbirî got: “Belê sed sal derbas bûn, sed salên xwînî û tundî û hewildana qirkirina gelê kurd û tunekirina hebûna kurdan.”**

**Hevpeyvîn: Hesen Mukerem**

**P: Dr Mihemed Zeyno piştî sed salan Peymana Lozanê feydeyê Kurdan çi ye vê peymanê bibîrt tînin ûKurd vê peymanê çawa fêm dikin?**

**B:** Di serî de, spasiya we dikim û ji xwendevanên rojnamê re silavan rê dikim.
Belê sed sal derbas bûn, sed salên xwînî û tundî û hewildana qirkirina gelê kurd û tunekirina hebûna kurdan.
Diyare çi sûda kurdan di xalên vê peymanê de ne bûn, berovajî wê, ev peyman ji me kurdan re bû xişim û bêtara herî mezin.
Wê rê li ber hovîtiya rejîmên dagirker vekir ku her şêwe zordarî bi kar bînin da ku hebûna kurdan ya madî ne mîne.
Piştî demeke kurt, di salên 1924 - 1925 û pêv e gelê kurd tûşî hemleyên leşkerî hat, çi aliyê dewleta Turkan ve be an jî ji aliyê dewleta îngiltera li Îraqê be.
Bi her şêweyî serhildana kurdan pûç û xeniqandin.
Di saya xalên vê peymana Lozanê de çavên xwe damiran din û guhên xwe girtin.
Serhildana Şêx Seîdê Pîran di salên bîstan de û serhildanên Barzaniyan di salên sihan de, tê wê wateyê ku gelê kurd ji dijî vê peymanê rabû ye û xalên wê ne pejirandiye.
Rewşenbîriya kurd û tevgera siyasî ya kurd sedsala peymana Lozanê bi bîr tînin, ne wek şahî û serkeftin, lê wek karesat dibînin.
Em vê peymanê bi bîr tînin, wekî em ji rayedarên dewletên mezin re û ji ronakbîrên wan re dibêjin:
De ka werin, bi rengekî ji rengan ne heqiya hikûmatên we serast bikin.
Wekî li cîhanê meletek heye û mafê wî heye. Wekî kurd hebûn û wê her hebin.

**P: Dr. Mihemed Zeyno li gorî nirxandina tu dikî, sedsala ku em tê de derbas dibin, ji bo Kurdan careke din derfeta wê yekê heye ku welatekî serbixwe were avakirin, an jî divê ji bo her perçeyek li gorî stratîjiya xwe xebatên cûda werin kirin?**

**B:** Diyare sînorên dewletan ne daîmin, her sedsalekê ew sînor tên rûxandin û guhartin.
Dewletên hildiweşin û hin din li şûna wan tên damezirandin.
Ev yasa çerxa felekê ye, diger e û dizivir e.
Her carê li qunckeî dunyayê paldide û bêhna xwe berdide.
Sedsala bîstan bû tarî û pîs bû bo me kurdan. Sedsala bîstan bû qernê tune kirina kurdan.
Çerxa borî ne ya me bû, ew ya miletê Afrika û asiya dûr û hin miletê Ewropa bû.
Li wan deveran bi dehan dewlet ava bûn, li wan herêman sîstema kolonyalîst Îngilîz û Fransî têk çû.
Di avabûna dewletan de para me kurdan,ne bû. Ji ber sedemên cuda, çi navxweyî û çi derveyî vîna me bin, em bê par man. Li gor min, raman û armanc û xebata ji bo dewleta kurdî, bi carekê ji hiş û bîr û rojeva kurdan derçû.
Heger mirovekî kurd behsa dewleteke kurdî kiriba, cew wek bêhişan dinasîn. Sedsalin me perçe bûna Kurdistanê wek qedereke xwezayî didît. Mercên damezirandina dewleta kurdî di dema niha de evin:

**1- aramiya navxweyî**
**2- daxweza dewleta kurdî bibe armanca sereke di ramana û lebata gel de.**
**3- hewildana dîplomatîk bi welatên xwedî hêz re.**

Bo min, motika dewleta kurdî îro roj li başûrî Kurdistanê kemiliye û di rojên dahatu de ew dibe armanc û bingeha dewleta Kurdistanê. Helbet hêviya serxwebûna Kurdistanê di hişê kurdan de dimîn e û pûç nabe.
Ew daxwez piştî rêverundumê hê bêtir bilind bû û rîşalên xwe berdannav hinavê gelê kurd. Ta ku em di xeyalan de nejîn, ta ku em xewnan ne firoşin, ta ku em Realität Kurdistanê bidin ber çavan, pêwîst e sîstema “ gav bi gav “ bê te rêkirin.
Ev sîstem tê wê wateyê ku di her beşekî bexwedana destkeftan pêk bînin. Ev bû sed sal rîşalên tevna civakî hatiye birîn.
Sed salin kurd ji hev cuda bûn e. Sed salin em di sînorên dewletan eyan de dijîn.
Heger di salên borîn de tevna civakî sist û qels bibû, di van bîst - sîh salên dawî de û bi saya pêşketina teknolojîyê ew sînor hatin qedandin û careke din gel bîr bi hev hat.
Heger hat û tevgera azadîxwez ya gelê Kurd bikanîba sîwanek bo xwe dirustkira, mîna encumaba netewî, wê gelek bi sûd ba.

**P: Dr. Li gorî yasa navnetewî 100 saliya Peymana navnetewî çi wateyê dide?**

**B:** Ez bi xwe ne parêzerim ta ku hûrgilîyên yasaya navdewletî ronî bikim.
Lê dostên me, parêzer dibêji, çi demeke eyan ji bo peymana Lozanê re nîn e. Ew kesê dibêje ku piştî sedsalî ev peyman betal dibe .... ne raste.

**P: Dr. Mihemd Zeyno vê carê piraniya aliyên Kurdî di civîna sedsaliya Lozanê de amade bûn bi nerîna we ev yeka dikare bibe cihê vê ku pirsgirêkên di navbera kurdan de kêm bike an êdî kurd bo piştevanî û yekbûna giştî pêngavan havêjin?**

**B:** Wê meclisa zaliman gelek xirabî bi kurdan kir. Dîrok dide xuyakirin ku piştî serketina Turkan di şerê li dijî Yûnan de, mixabin bi alîkariya kurdan, peymana Sevrê bê wate ma.
Ji ber hindê rayedarên dewleta tur dikanîn bi hêsanî kurdan ji danûstandina dûrxin û bi aliyên cudan re karê xwe rê kin.
Di ean salan de hê gelê kurd ji bin rëşî û tariya sedê salan a dewleta Osmanîyan rizgar ne bibû.
Ramana netewî ne kemilî bû, tevgereke çalak peyda ne bibû, kesatiyeke kurd berz û bi hêz lu kanîba kurdan li dor xwe bicivîn e diyar ne bû.
Ramana olî îslamî serdest bû û bi bandur bû.
Beruvajî turkan û ereban, gelê kurd gelek,li şûn,ma bû û nikanî bû xwe ji qeyd û bendên “ biratya misilmanan “ a xapînok rizgar bikira .
Ev xal û hin mercên dîtir rê li ber têkbirina peymana Sevrê bibra û bi hêsanî rê li ber peymana Lozanê vekirina.

**P: Dr. Mihemed Zeyno li gorî pênaseya Viyana ya li ser peymanên navdewletî “Vienna Convention on the Law of Treaties (VCLT)”, peymana Lozan dikare encamên peymana Sevrê betal bike yan jî na?**

**B:** Realîteya gelek kurd dide diyarkirin ku gel yeke û li ba heve, yek helwest û yek armance.
Em şad in bi serkeftiyan, cem xemgînin bi têkçûnan. Êşa Mihabadê a Qamişloyê ye. Derdê Sine ê Efrînê ye Axîna Serhedê ya Cizîrê ye.
Şahî û dîlana Hewlêr û Silêmaniyê ya Kobanê û Makoyê ye. Di şahoyan de, di şînan de gel bi hev re ye. Çi nakokiyên kûr di nav gel de nînin.
Tenê maye tevgerên siyasî bên ba hev û li ser hin xalan li hev bikin. Di civîna hevbeş de nakokî kêm dibin, pirs çareser dibin, rewş aram dibe.
Helbet, hêviya me ew ku tevgera azadîxwez ya gelê Kurd herdem li xalên berhevhatinê bigerin û berjewendîya Kurdistanê, wek welatekî yekgirtî bi parêzin.

Sedsala borî ya perçebûnê û şerê navxweyî û têkçûna netewî bû. De bila Sedsala bîstan û yekan bibe pêvajoya çareserî û yekrêzî û damezrandina Dewleta Kurdistanê be.

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicrî:”**

Ji bilî sûcdarkirina vê û wê ji bo parçebûna xwe, em werin ser hişê xwe û hizr li girêbestek netewî bikin.



**“Mesrûr Barzanî”:**

Bila tevahiya aliyên siyasî bihevre kar bikin.



**“ Joe Biden:”**

Em dixwazin hevahengiya xwe ya bi Tirkiyê re bidomînin.



**“Osman Baydemîr ”:**

pêwîstiya Kurdan bi yekîtiyê .

# Rojava; Handana têrorîzma dewletî ya rêjîma Îranê û îxanet li dijî mafên mirovan



## N: Elî Bidaxî

Di heyama kêmtir ji 20 rojan de, du biryarên girîng ên civaka navdewletî û bi taybetî jî dewleta Bêljîkê li ser mijara çarenivîsa gelên Îranê, hem nîgeranî û bêbaweriya xelkê wî welatî ji cîhana Rojava zêde kir û hem jî hizra bi navê demokrasî, azadî û siyasetên mirovdostane xiste bin pirsyarê.

Bûyera yekem destnêşankirina Îranê bû ji bo xula nû ya Foruma Civakî ya Civata Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ku di Çile de hate destnîûankirin. Di demekê de ku armanc û planên diyarkirî yên vê rûniştina konferansê “tevkariyên zanistî, jêhatî û nûjen in, ji bo pêşdebirina mafên mirovan”, dê rejîmek were hilbijartin ku berpirsiyariya konferansê bigire stuyê xwe ku rûyê wê ji bo her dewletek cîhanê eşekere ye.

Bûyera duyem, biryara dewleta Bêljîkê bû ku li şûna welatiyekî ku ji aliyê Sipaha Pasdarên rejîmê ve weke dîl li Îranê hatibû girtin, Esedullah Esedî dîplomatê têrorîstê rêjîma Komara Îslamî ya Îranê azad kir. Pevguhertina sivîlekî bêguneh bi têrorîstekî re ku kiryarên wî yên têrorîstî li dadgehe bilind a Ewropî hatine selimandin, bêrêziyek e ji bo pirensîpên mafên mirovan ên ku ji aliyê Rojava ve tên pejirandin û derfetek e ji rejîmê re ji bo berdewamkirina kiryarên xwe yên têrorîstî.

Di rastî de her ji destpêkê ve, rêjîma Komara Îslamî ya Îranê bi dagîrkirina Balyozxaneya Amerîkayê li Tehranê, hêza xwe li ser dîlgirtinê ava kiriye.
Cihê xembariyê ye ku niyeta rêjîma Komara Îslamî ya Îranê ji dîlgirtinê weke amûreke siyasî, bidestxistina diravên blokekirî û îmtiyazên siyasî ji bo xwe di danûstandinan de, azadkirina sîxûr û têrorîstên xwe yên girtî li welatên Rojavayî, yan jî tirsandina civaka cîhanî bû; Sedema sereke di vê navberê de lawazbûna welatên Rojava û asayîkirina bacên rejîmê ye. Tevî ku sivikbûna weke Îran-Kontra di salên 1990 de û bi dehan riswabûnên din ên mîna Bêljîkê ji bîr naçin, dîsa jî Komara Îslamî hertim hewl dide wan weke derfet bi kar bîne ji bo azadkirina dîlgirtiyên siyasî. Ji bo vê mebestê jî rêjîm hin kesan li dervey sînorên xwe jî direvîne. Dema ku Rojava bacê dide rêjîmê, rêjîm jî dibêje ev kiryar derfetê didin ku rêjîm karên xwe li dervey welat berfirehtir bike. Lewma jî rêjîm li ser van kiryarên gemar berdewam e.
Her kes dizane ku Îran ti rêzê ji nirxên navnetewî û mafên navnetewî re nagire û rejîmeke têrorîstî, dîktator û dijî gel e ku xelk dixwaze vê rêjîmê ji holê rake. Biryar bû Sipah jî bi awayekî praktîk li Bêljîkê ji aliyê parlamentoya Ewropayê ve bikeve lîsteya têrorê lê hevdem Joseph Borel Berpirsê Siyaseta Derve ya Ewropayê bi hinceta ku ev mijar di yasayê de cih nagire û ji aliyê dadgehê ve biryar nehatiye standin, ev mijar ji holê rakir. Lê niha welatek di heman Yekîtiyê de biryara dadgeheke fermî ya ku Esedulla Esedî bi tawana destêwerdan di kiryarên têrorîstî de bi 20 salan girtîgehê siza kiribû, dişkîne û wek diyarî pêşkêşî rêjîma Komara Îslamî ya Îranê dike.

Xuya ye heya dema ku siyaseta bêdengî li hemberî Îranê ji aliyê Rojava ve, rêzgirtin ji Îranê û dayîna bacê ji bo Komara Îslamî ji aliyê rojava ve berdewam be, dê rejîm di kiryarên xwe de ji bo bidestxistina îmtiyazên aborî û siyasî ji civaka navdewletî berdewam be. Bi taybetî ku armanc yan jî bo wateyeke din, destkeftên rêjîma Komara Îslamî di siyaseta dîlgirtinê de, bihêzkirina xala parastina dîplomatan ji lêpirsîna yasayî ye û rê dide rêjîma Îranê jî vê weke derfet ji xwe re bi kar bîne.
Rejîma Îslamî ya Îranê di şeş mehên borî de herî kêm 300 kes li ber çavê civaka navdewletî darve kirine û piştî vegera Esedulla Esedî jî rêjîm di ragihandina xwe de nîşan didin ku ji aliyê Cehrumî berdevkê dewletê û Xerîbabadî nûnerê navdewletî yê saziya Dadê ya rêjîmê ve hatiye pêşwazîkirin û tê hembêzkirin. Ev kiryara Bêljîmê jî, ji bilî piştevanîkirin li terorîzma dewletî û garantîkirina parastina hewlên rêjîma Komara Îslamî ya Îranê ji bo tepeserkirina maf û azadiyan li navxwe û derve, xiyanetkirin li mafên mirovan e.

Helbet heya dema ku mijara mafên mirovan û paşguhkirina têrorîzma dewletî ya rêjîma Komara Îslamî bibe qurbana bazara Rojava bi Komara Îslamî re, dê rejîm bi awayekî eşkere zêdetirî berê li ser tawanên xwe berdewam be.
Tê zanîn Esedulla Esedî yê têrorîstê Îranî ku weke dîplomat dihate binavkirin, destê wî di danîna bombeyekê de li dijî tevgereke opozîsyoya Îranî hebû.

Ew piştî berdanê rasterast çû Tehranê û ji aliyê berpirsên rêjîmê ve hate pêşwazîkirin.
Lê opozîsyona Îranê û di seriya wê de jî hêzên Kurdî bi vê kiryara dewleta Bêljîkê ji bo berdana wî nerazî ne û nerazîtiya xwe jî anîne ziman.

Di seriya wan de Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê ragihand ku bi azadkirina wî têrorîstî, careke din destên vê rêjîma gemar ji bo pêkanîna kiryarên bi vî rengî li dervey welat vekirî dibin.
Çalakvan jî dibêjin rêjîma Tehranê her û her çalakvanan li derve têror dike, Rojava jî ji bo berjewendiya xwe çavên xwe digire.

# Rojhilata Navîn û qonaxeke nû



N: Ebdulezîz Qasim

Min berî çend rojan, gotarek nivîsandibû bi navê (Sûriya û qonaxeke nû), li ser amadebûna serokê Sûriyê di lûtkeya komkara Erebî de ya li 19'ê Gulana borî de hatibû lidarxistin, piştî yazde salan ji birîna têkiliyên Erebî ligel rêjîma Sûriyê bi sedema krîza Sûriyê ( Şoreşa Sûriyê) ku li bihara 2011an destpê kiribû û heta niha ti çareseriyek bo nehatiye dîtin, belkî ev krîz mezintir bûye û ji krîzek navxweyî bûye krîzek herêmî û navdewletî bi sedema destêwerdana çend dewletên herêmî di karubarên Sûriyê, bi taybetî destêwerdana Tirkiyê û Îranê û nemaze rola xirab ya Tirkiyê ku îro gelek navçeyên kurdî li Rojavayê kurdistanê dagîr dike.

Lê wisa diyar dibe ku netenê Sûriya berbi qonaxeke nû diçe, ku navçeya Rojhilata Navîn bi timamiya xwe berbi qonaxeke nû diçe, ku netenê amadebûna Serokê rêjîma Sûriyê di lûtkeya Erebî de bo cihê pirsê, herwiha ku amadebûna Serokomarê Ukraynayê Zelenskî pirsên mezin çêkirin, bi taybetî ku dewletên Erebî û nemaze Erebistana Siûdiyê bi awayekî fermî helwêsta bêalîbûnê di şerê Rûsya-Ukraynayê de standibûn.

Dibe ku li gorî hin diplomatkar û çavdêr û şirovekarên siyasî, ku Erebistana Siûdî, dixwaze bi însiyatîfekî rabe ji bo çareserkirina Şerê Rûsiya û Ukraiyna, û herwiha dibe ku Erebistana Siûdî ji ber têkiliyên wê yên vê dawiyê ligel Îranê, hewl dide ku bi rêya vexwendina Zelenskî welatên rojavayî razî bike, bi awayekî ku bête xwendin ku beşdariya Zelenskî di lûtkeya Erebî de, wekî piştgiriya Ereban ji Ukraynayê re li ser hesabê Rûsyayê were şîrovekirin.

Lê bi dîtina min dibe ku beşdariya Zelenskî di lûtkeya Erebî de, pitir wekî hewldanek Erebî be ji bo dîtina çareseriyekî bo şerê Rûsya-Ukraiyna, ji ber ku krîza Sûriyê jî çareser nabe berî çareserkirina krîza Ukraiynayê, bi wateya ku divê Rûsiya û Amerîka li ser pirsgirêkên herêmî (Sûriya, dosyaya etomiya Îranê) bigehêjin têgihîştinekî, û dibe ku destpêk ji çareserkirina kirîza Rûsya-Ukraiyna be.

Di vê çarçoveyê de, wekî dibînin, her wekî gelek



çavdêrên siyasî amaje bi wê yekê dikin, ku navçeya Rojhilata Navîn li ser bingehekî pragmatîk ji nû ava dibe, ku dibe hevpeymaniyên nû di navbera dewletên vê navçeyê de ava bibin, ku ev dewlet bi rêya wan çareseriyekî ji bo qeyranên xwe yên kûr bibînin, bi taybetî kirîzên aborî û siyasî, yên ku piştî şerê li Ukraynayê peyda bûne, wek me dît ku bi awayekî neçaverêkirî, bi serkêşiya Çînê, ku nêzîkbûnek di navbera Erebistana Siûdî û Îranê de peyda bû, her wisa vegera rêjîma Sûriyê di nav civînên komkara Erebî piştî pitir ji yazde salan ji birîna têkiliyên Erebî digel rêjîma Sûriyê!

Dibe ku di rojên pêş de, bi heman awayî têkiliyên din di navbera dewletên navçeyê de peyda bibin, ku tê çaverêkirin têkilî di navbera Misr û Îranê de peyda bibin, belkî jî têkilî di navbera Sûriya û Misrê de û herwiha di navbera Misr û Tirkiyê de jî peyda bibin, lê piştî serkeftina serokkomarê Tirkiyê Erdogan di helbijartinan de, dibe ku krîzên Tirkiyê yên aborî û navxweyî zêdetir bibe, nemaze piştî erdheja Mereşê û herwisa helwêsta nû ya Amerîka li dijî asayîkirina têkiliyên digel rêjîma Şamê, ku wê bibe rêgir li pêş bicihkirina siyaset û pirojeyên Tirkiyê li Sûriyê.

Berovajî van nêzîkbûn û rêkeftinên herêmî, em dibînin ku parçebûna kurdan roj bi roj zêdetir dibe, nemaze li Rojavayê kurdistanê, ku îro pêdiviyek dîrokî heye bo rêkeftineke kurdî-kurdî, nemaze bi hatina 100 saliya salyada rêkeftina reş ya Lozanê di 24'ê tîrmeha 1923an de, herwiha ku li gorî hin çavkaniyên nûçevanî ku hewlên cidî ji aliyê dewletên Erebî ligel Amerîkiyan hene ji bo ku hêzên kurdî bibin beşek ji çareseriya krîza Sûriyê, tevî hewldanên dibin ji bo ku QSD bikeve di nav desteya danûstandinên Sûrî de, ya ku li ser biryara navdewletî 2254 li Cinêv dixebite.

# Kurdekî Efrînê dibe Nûnerê Hertimî yê Sûriyê di Komkara Erebî de

Sûriye Kurdekî Efrînî wek nûnerê nû yê Sûriyê di Komkara Erebî de û Serokê nûneratiya dîplomatîk a Sûriyê li Qahîre destnîşan dike.

Rojnameya nîvfermî "Al-Wetan" tekez kir ku Serokê Beşar Esed biryarek derxist û tê de Balyoz Husamedîn Ala wek Nûnerê Hertimî yê Sûriyê di Komkara Erebî de destnîşan kir.

Destnîşankirina Balyoz Husamedîn Ala, piştî nêzîkî mehekê ji biryara vegera Sûriyê bo Komkara Dewletên Erebî tê. Sûriye piştî 12 salan, roja 7ê Gulana 2023an di civîna Wezîrên derve yên welatên Komkara welatên Erebî li Qahîreyê de biryara vegera wê bo Komkara Erebî hat dayîn.

Husamedîn Ala ku Kurdekî Nahiya Mabeta a ser bi Efrînê ve ye, sala 1966an jidayîk bûye û pêştir çendîn post di hikûmeta Sûriyê de wergirtibûn, ku piraniya wan di nûnertiyên dîplomatîk ên biyanî de bûn.

Husamedîn Ala 8 salan wek Nûnerê Hertimî yê Sûriyê li Ofîsa Netewên Yekgirtî û rêxistinên navdewletî li Cinêvê kar kiriye. Di navbera 1996 û 2001ê de jî li Nûnertiya Sûriyê ya Netewên





Yekgirtî li New Yorkê kar kiribû.

Piştî wê jî bû Balyozê Sûriyê li Vatîkan û piştre jî Balyozê Spanyayê, berî wê jî Rêveberê Ofîsa Wezîrê Derve yê niha Feysel Miqdad bû.

# Jin di ziman de



**N: Vênûs Fayq**
**W: Hesen Mukerem**



Zilamek giriyabe, gotine "wekî jinê digirî", weke vê ku zayenda giriyanê mê be.

Û jinên ku jî di axavtiên xwe de heman tişt berhem aniye, weke dibêjin "Dayîka kuran bî"an "kurê te nemire" an "ev mala ku keç hundr de tunebe şîna wan sar û sire" an ji kesûkarên xwediyê mirî re hatiye gotin ku "temendirêjî bo kurê we hêlabe" û … hwd.

Lopir Tîster Fîlid dibêje: "Peyv mijarên hizrikirina me ne.. Nabe hizrkirina me di mijareke kevin û kêrnehatî de derbikeve". Çimkî ber her tişta axavtinê reheke kultûrî û malbateke perwerdeya kombûna ser hev heye, ev peyvên ku di pêşiya ziman de, me perwedey pê didît û digel de rê hatine, ev mebesta jî ne be, bo mînak carekê mela Star got: Hikûmeta Herêmê hikûmeteke bi modela mê yane, peyva "mê" bikar anî bo temsîlkirina hikûmeteke lawaz û bê mifah..

Axir, piraniya zilamên civaka me, bi destê jinekê perwerde bûne, ku dîttine ti rêzek ji wê nehatiye girtin û pê ra bi zimanê rêz û hurmetê ve neaxavitine û rêz li axavtina wan nehatiye girtin, lewma piştire bûye kultûra axavtin û helwesta wan..

Wan stranên wisa guhdarîkirine ku jin weke demek xûrak û çavkaniya xweşî û heyecanê nîşan daye, bi temisîlkirina sing û memik û navqed û patik û guzînkê.. Bilindtirîn asta temisîlkirina jinê di wêjeya Kurdî de heyv û mêve û gul û pêşinma ye..

Di rastiyê de cem wan "Jin" peyveke ku li hember bi wateyên "lawazî, bêdesthilatî û bêşiyan û … hwd ne."

Di sîstemeke perwedeyê de ku, hêzek zilam hene û di nav de perwedehî dîtine, wêjeya axavtineke mirovî hîn nekirine, êdî hewcehiya me bi tevgereke radîkal nabîne, tenê bi teorî ji me ra bêjin Jin însan e, ger bo dezegeheke dewleta radîkal û lîberal tercûme neke û dîtingeha tevahiya civakê li hember jinê serrast neke, û berfirehiyê bi zanista axavtinê bide, peyva "jinê" bi rêz û hurmet ve bê bikaranîn nek remzek bo sivikatîkirin û bi kêmzanîn be, xeynî şirovekirin bo peyvên jinê, afret û mê û danasîna jinê di piraniya henekan de.

Tevgerên jinan, ku hîn sînorê teoriyên xwe derbas nekirine, bi dijberîkirina zilam hesteke nerênî bi jin bûna wan di jinê de tarîkiriye, bi qasî ku li ser mezinahiya wê diaxavin, ewqas li ser hûrgiliyên nav wêneya mezin a wê naxavin da ku hewla çareserkirinê bidin..

Ew pir baş in, ew modela ku di axavtina zilaman de ku jin sivik kiriye dibînin, heta ev îşaretên teorî yên naşîrîn yên di şakarên wan de, şirovekirina "Jin"ê mîna sembolekê bo xweşî û temisîlkirina laşê wê mîna vê ku ajek be..

Ew axavtina zilaman e ku mebest sivik kirina jinê û teşekirin û sekinandina wê ye, Enîşteyn dibêje: "Jinek ku li pey komê kevtibe, dûtir ji vê ku kom çav lê dike nameşe.

Lê, jinek ku tenê dimeşe, digihîje bi cihekê hîn ti kes negihîştiyê."

Êdî pirsyar eva nine ku ez dixwazim bigihîjim bi kuderê, belkû pirsyar eva ye ku bi amûra ziman jî rêzê ji min nagirî çima dixwazî min bidî sekinandin?

Di navbera gotûbêjekê de ku pirsekê dikim, ji bersiva vê girîngtir çawaniya hizrikirin û çawaniya gotinê ye, ya ku jêra zimanê axavitinê tê gotin, bikar anîna peyva goncav di cihê goncav de ye, renge bersiva vê peyvek an hevokek be, lê dibe bizanî çi tiştekê û li çi cihekê de dibêjî.

Di Civaka me de jî ku keç û kur wekhev perwerde nabin, di ziman de jî bê însafî digel jinê tê kirin.

Di ditîngeha piraniya zilaman de wisa ye ku zayenda axavtinê jî her nêr e, bi bê liberçavgirtina orf û exlaqê axavtinê û bi bê hizrkirinê diaxavtin, bitaybet axavtin digel an jî li derheq jinê de be.

Axir zimanê Kurdî ku bi rêkevta wekheviyê dinavbera her du zayenda de hatiye berhevkirin û dibêjin "tu" an "ew", lê di zimanê axavtin û wêjeyê de bi hinek gotin û peyvên baw, jin naşirîn kiriye, weke li hember danîna zilamekî aram, ku birêz û hurmet ve digel hevjîna xwe reftar dike, ji ra gotine jinanî, wisa dizanî ku jin e.

# Dêhgolan; Kuştina jineke ciwan ji aliyê hevjînê wê ve

Roja Duşemî 8ê Cozerdanê jineke ciwan bi navê "Perestû Şehbazî" xelkê gundê Mîrkî yê ser bi Dêhgolanê ji aliyê hevjînê xwe ve hat kuştin.

Li gor çavkaniyeke agahdar, ev jina ciwan ji aliyê hevjînê xwe "Peyam Şerîfî" ve bi kêran hatiye kuştin.

Vê çavkaniya haydar herwisa got: "Perestû Şehbazî" qurbaniya zewaca zarokan bûye û di temenê 12 saliyê de neçar bûye ku bizewice.
Vê çavkaniya haydar diyar kir: Hevjînê "Perestû Şehbazî" bêkar e û bi madeyên hişber ve girêdayî ye û ji destkutiyê azaran dibîne.

"Perestû Şahbazî" 18 salî û dayîka zarokekî biçûk bû.

# Cudahiya siyaseta Rojhilata Navîn û welatên Ewrupî



**N: Hesen Mukerem**

Di welatên ku pergala demokrasiyê hakim e an hikûmet li ser esasên demokrasiyê birêve diçe, rexnekirin û pirsgirkên welatiyan tên berçavgiritin.

Di welatên ku li ser bingeha demokrasiyê birêve diçin, dewlet an desthilatdar bona çareseriyê, dikeve hewl danan, lê di welatên ku dîktatorî serdest e û desthilatdar an birêveberên hikûmetê ku dîktator in, ti guhdariyek ji rexne, pirsgirêk û astengiyên ku pêsîra welatiyan digrin nagirin û bersiva daxwazkariyên rexnegirên welat nadin.

Tişta ku di welatên demokrasî serdest e an bi zelalî behs bikim, di welatên Ewrupî de pirsgirêkên welatiyan an yên dewletan di kûrahiya binyatê de çareser dikin lê, di welatên Herêma Rojhilata Navîn de, an welatên ku dîktatorî serdest e, pirsgirêk û astengiyên li ser rêya jiyana welatiyan bo desthilatdaran ne girîng e û ti hewldanekê bona çareseriyê nadin.

Welatên Ewrupî aliyê kêm 200 salan pêş li welatên Rojhilata Navîn de dijîn yanî ewqas pêşkevtî ne, her welatiyek xwediyê hemû mafê mirovî û hikûmî yê xwe ye.

Yanî wiha birêveberiyek nîşan dide ku dewlet pirsgirêk û astengiyên welatiyan bi hişmendî û di kûrahiya reha wê de çareser dike.

Lê, di Herêma Rojhilata Navîn de, ti welatiyek xwediyê mafê xwe yê mirovî û însanî nine, hikûmetên Rojhilata Navîn wisa nîşan didin ku di welat de ti pirsgirêk tuneye, di medyayan de welat bi bedeviya bihuştê temisîl dikin, yanî wisa nîşan didin ku welatî bixweşî û bê ti kêmasiyekê jiyana xwe derbas dikin.

Mixabin, wisa nine, di heqîqetê de, tenê desthilatdar digel malbatên xwe, jiyaneka bê pirsgirêk hene û ji hemû tiştî de pişkdar in, yanî welat cihenemek mezin e û welatiyên hejar û bê par ji hemû mafê mirovî yên xwe di vê cihenemê de dişewtin û ti kes nine ku bi hawara wan de were, an qîrînênên wan guhdar be.

Bo mînak, di Îranê de, desthilatdar û zarokên wan baştirîn jiyan hene, zarokên wan di baştirîn zanîngehan de xwandina xwe diqetînin, xwarinên giran û bi lezet dixwen seferên dervey welat dikin, lê berovajî welatiyên hejar ji mafê xwandin û jixwekirina kincên bedev û heta seferên hundrî welat jî bi sebeba nebûniyê bê par in.

Desthilatdarên Îranê bi hemû awayî welatiyên ku wan ji ber nebûnî û felaketa ku welat li hundir de asê bûye, rexne dikin an behsa kêrnehatîbûna rewşa jiyana xwe dikin, wan digrin, an heps dikin an bi îşkencekirin û lêdanê wan dikujin.

Di demekê de ku, zarokên berpirsên Îranê di welatên Ewrupa û Amerîka û Kanadayê de di baştirîn rewşa jiyanê de ne û ji hemû îmkanantên jiyanê sûdmendin.

Di sala 2022`an de Serokê Emeliyata Hêza Bejahî ya Spaha Pasdaran a Îranê eşkere kir ku nêzî 4 Hezar zarokên berpirsên Komara Îslamî di welatên Amerîka, Ewrupa û Kanadayê de jiyan dikin.

Ev yeka nîşan dide ku rewşa jiyana welatiyan an bi taybet rewşa jiyana welatiyên ku di bajarên sînorî de yanî bajarên Kurdistan û Sîstan û Belûçistan ku di xirabtirîn rewşê de ye, bo berpirsên hikûmetê negirîng e û dema ku ew li hember wê rewşa xirab a jiyana xwe de hikûmetê rexne dikin an pirsgirêkên jiyana xwe tînin ziman, hikûmeta dîktator bi tundtirîn şêweyî digel wan reftar dike.

Heta dibînin di bajarên Kurdistanê de, ciwanên Kurd bona dabînkirina debara jiyana xwe neçar dibin bi kîlometran mesafetên dûr û dijwar di sînoran de bimeşin û sînoran derbas bikin.

Da ku bikarin li welatên cîran yanî Tirkiye û Îraqê kelûpelan bi kolberiyê ku karê herî giran û dûr ji kirameta mirov e bo hundirî welat bînin, lê her roj di nuqteyên cuda yên sînorî de hêzên leşkerî yên Îranê bi destûra dîktatorên navendî, wan kolberan didin ber guleyan, heta niha bi hezaran kolber di vê rê de hatin kuştin an birîndar kirin.

An li Sîstan û Belûçistanê welatî ji hemû mafê jiyanê bê par in, heta bo ava vexwarinê jî rastî astengiyên bê sînor dibin, lê berpirsên hikûmetê dicihê evê ku rêkarên bingehîn bona çareserkirina pirsgirêkên ku pêsîra xelkê wan herêman girtine, bigrin berahîka xwe û di kokê de çareser bikin, bi hêza leşkerî êrîşî ser wan dikin an her guhdarî rexne û daxwazkariyên wan nagirin.

Yanî di welatên dîktator an di piraniya welatên Rojhilata Navîn de rexnekirin û behskirina pirsgirêkên jiyan û ci-



vakê bi hemû awayî qedexe ye û ger mirov cesaret bike behs bike jî dibe, can jidestdana xwe bîne ber çavên xwe
.
Di welatên ku dîktatorî zal e, her tiştî wateya xwe winda kiriye, her roj çawa ku hinek bimirin, stêr xeydîne û ewr li qeraxê ne û birînên jiyana dijwar û bê îdaletiyê, xwe di dilê mirovên bin destê zaliman de dipêçin.

Di dawiyê de, gotinek pêşiyan heye ku dibêje, zikê têr hay ji zikê birçî nine.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Sine: Çalakvanê kedkarî Îqbal Şeibanî bi danîna barimteyê hat berdan

Roja Çarşemî 10'ê Cozerdanê, çalakvanê kedkarî yê bajarê Sinê "Îqbal Şeibanî" piştî danîna barimteya 500 milyon Tûmenî, bi awayekî demkî ji girtîgeha bajarê Sinê hat berdan.

Ev çalakvanê kedkarî, roja Sêşemî 9`ê Cozerdanê, ji girtîgeha îtla`ata Sinê bo girtîgeha Sinê hatibû veguhastin.

Roja Înê 29'ê Banemerê ev çalakvanê kedkarî ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatibû binçavkirin û ji bo lêpirsînê bo girtîgeha îtla`ata Sinê hatibû veguhastin.

Di Banemera 1398'an a Rojî de, ev xebatkarê kedkariyê ji aliyê taya yekem a Dadgeha Şoreşê ya Sinê bi serokatiya dadwer "Saîdî" cezayê salek hepsa ragirtî û sê sal hesp bo hatibû birîn.

"Îqbal Şeibanî" roja Sêşemî 30'ê Rêbendana 1997'an, li yek ji cadeyên bajarê Sinê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatibû binçavkirin û piştî 28 rojan ji binçavkirinê, bi danîna barimteya 100 milyon Tûmenî, bi awayekî demkî hatibû azadkirin.

## Sine: Xebatkarê kedkarî Kemal Kerîmî bi danîna barimteyê hat berdan

Roja Çarşemî 10'ê Cozerdanê, "Kemal Kerîmî", çalakvanê kedkarî yê xelkê bajarê Sinê, piştî danîna barimteya 500 milyon Tûmenî, bi awayekî demkî ji girtîgeha bajarê Sinê hat azadkirin.

Ev çalakvanê kedkarî piştî bidawîhatina proseya lêpirsînê ji navenda îtla`ata Sinê bo girtîgeha vî bajarî hatibû veguhastin.

"Kerîmî" êvariya roja Çarşemî 27ê Banemerê tevî komek ji çalakên kedkariyê ji bo rêzgirtina bîranîna Homan Ebdullahî, yek ji qurbaniyên serhildana şoreşa Jin, Jiyan, Azadî, dema ku çû mala bavê xwe, hêzên ewlehiyê bi bê nîşandana belgeya dadgehê avêtin ser mala Ferşîd Ebdullahî û bi tundûtîjiyê navbirî binçavkirin.

Ev xebatkar piştî binçavkirin, ji bo lêkolînê bo girtîgeha îtla`ata Sinê veguhastibûn.

## Li Sinê welatiyekî Kurd hat girtin

Roja Yekşemî 7 Cozerdanê welatiyekî Kurd bi navê "Şoreş Mihemedpûr" kurê Haşim xelkê gundê "Tengîser"a ser bi Sinê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat binçavkirin.

Li gor çavkaniyeke agehdar, hêzên ewlehiyê ev welatiyê 36 salî bi bê nîşandana belgeya dadgehê li cihê karê wî binçavkirine.

Vê çavkaniya haydar herwisa got: "Mihemedpûr" piştî binçavkirinê bo cihekî nediyar hatiye veguhastin.

Vê çavkaniya haydar diyar kir: Şopandinên malbata vî welatî ji bo zanîna çarenivîsa wî bê encam mane.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê, ti zanyariyek derbarê sedema binçavkirin û tohmetên li ser bi "Mihemedpûr" de tine.

## Welatiyekî Kurd bi 15 meh heps hat cezakirin

Welatiyê Kurd yê bi navê "Rêbwar Talbî" kurê Kemal û xelkê Banê, ji aliyê taya 101 a dadgeha cezayên giran a 2 a vî bajarî, bi sê meh hesp û salek hepsa ragirtî hat cezakirin.

Dadgehê ev welatiyê han bi "propaganda dijî nizamê bo berjewendiya yek ji partiyên Kurd ên opozisyona hikûmeta Îranê" tometbar kiriye.

Civîna dadgeha "Talbî" di 20ê Banemerê de li taya 101 a dadgeha cezayê giran a du Banê hat lidarxistin.

Ev welatiyê han di meha Rezbera sala 1401`an a Rojî de, bi danîna barimteya 300 milyon Tûmenî heya dawîhatina dozê, bi awayekî demkî ji girtîgeha Banê hatiye azadkirin.

Ev welatiyê Kurd 30'ê Tîrmeha 1401'an, li çarêya "Sale Abad" a bajarê Banê, bi bê nîşandana belgeya dadgehê ji aliyê îtla`ata Spaha Pasdaran ve hatibû binçavkirin û bo lêpirsînê bo girtîgeha vê rêkxirawê li bajarê Sinê hatibû veguhastin.

Ribwar Talbî piştî lêpirsînê bo girtîgeha Bane hatibû veguhastin.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (447)

## Wêneyên semînara 100 saliya Peymannama Lozanê li Swîrayê









